Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :971 | 15-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Li Til Birakê pêşangeha destkariyan hat vekirin

**Navenda Çand û Hunerê ya navçeya Til Birakê û Komîteya Rêvberiya Dibistanan pêşangeheke destkariyan vekirin.**

Navenda Çand û Hunerê ya navçeya Til Birakê bi hevkariya Komîteya Rêveberiya Dibistanan pêşangeheke kardestiyan li avahiya çand û hunerê vekir.

Bi dehan şêniyên navçeyê di pêşangehê de amade bûn.

Rêvberiya Navenda Çand û Hunerê ya Til Birak Xîtam El-Elî bi xêrhatina haziran kir. Piştre Koma Şehîd Seide û Hind govend pêşkêş kirin.



Her wiha hunermend Teleb Nazir li gel awazên rebabe stra.

Piştre beşdaran li hola pêşangehê geriyan.

***ANHA***



# Li Qamişlo şevbiwêrka hunerî û wêjeyî

**Komîteya Çand û Hunerê ya kantona Qamişlo, Komîteya Çand û Hunerê ya navçeya Qamişlo û Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê li bajarê Qamişlo şevbiwrkeke hunerî û wêjeyî li dar xistin.**



Bi dehan şêniyên bajarê Qamişlo bi hemû pêkhateyên wê tevlî wê şevbuhêrkê bûn ku li baxê giştî hat lidarxistin.

Endamê rêveber ê Komîteya Çand û Hunerê ya Kantona Qamişlo Cemîl Ehmed bixêrhatina beşdaran kirin, piştre hunermend Vajlîn Cuma çend stran got.

Piştre çend helbestên suryanî ji aliyê helbestvan Mişêl Fiyo ve hat xwendin, akter Şevzan Mehmûd jî şanoyek bi navê "Wasta" pêşkêş kir.

Koma Heval çend stran û helbestvan Ebûd Mexso helbest gotin.

Tê payîn Komîteya Çand û Hunerê ya kantona Qamişlo, Komîteya Çand û Hunerên ya navçeya Qamişlo û Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê li bajarê Qamişlo her roja Înê bi dirêjahiya werzê havînê heman şevbuhêrk lidar bixîne.

***ANHA***

# Ewleyiyê Qesra Ceʾber kir cihê seyranê



**Qesra Ce'ber ji bo DAIŞ´ê keleheke parastinê bû û 3 salan jî çeteyên DAIŞ´ê ev qesra dîrokî dagîr kiribû.**

Qesra Ce'ber ji bo DAIŞ´ê keleheke parastinê bû û 3 salan jî çeteyên DAIŞ´ê ev qesra dîrokî dagir kiribû. Hêzên QSD´ê sala 2017´an gava berê xwe dan rizgarkirina Reqayê, ev Qesra Ce'ber yan jî Kela Ce'ber ji çeteyan rizgar kiribû. Ev keleha hanê ji sedsala 11´ an maye û îro, tevî êrişên dewleta Tirk a dagirker jî, xelkê deverê hez dike biçe serdana wê û bêhna xwe lê vede.

Piştî ku ewlehiya hawîrdorê û Reqayê baş bû, îro roj kesên diçin serdana vê qesra tê de 35 pir, mizgeftek û muzeyek hene, herdiçe zêde dibe.

DAIŞ´ê ev dever weke mezintirîn zindana xwe û cihê pererdekirina leşkerên zarok bi kar dianî. Hingê serdana qesrê qedexe bû, îro tûrîstên deverê tên, lê digerin, bêhna xwe lê vedidin, malbat selfiyên xwe digirin û seyrana xwe dikin.


Wênegirê ajansa nûçeyan a Fransî AFP´ê Delîl Suleiman jî wêneyên halê nû yê qesrê girtine.

***Ozgûr Polîtîka***

# Metnên nivîskî werdigerîne resman

**Li dinyayê her ku internet pêş dikeve û teknolojî derfetên nû derdixe pêşiya afirîneran, li gorî wê, tiştên nû jî tên ceribandin.**

Li dinyayê her ku înternet bi pêş dikeve û teknolojî derfetên nû derdixe pêşiya afirîneran, li gorî wê, tiştên nû jî tên ceribandin. Niha jî aqilekî ku bi destê merivan hatiya çêkirin, yê bi navê "Dall-E Mini" li gorî metnên ku jê re tên xwendin, dîmenan disêwirîne ango resman çêdike. Yanî "Dall-E Mini" li gorî metnên jê re tên xwendin, dîmenan disêwirîne û wekî resm qeyd dike. Ev aqilê çêkirî navê xwe ji şêwekarê surrealîst Salvador Dalî û Robotê Pixarê yê bi navê Wall-E digire. Ji hêla şirketa OpenAI ve hatiye afirandin. Li gorî hevokên ku dibihîse di nav sanîyeyan de wêneyan disêwirîne. Wêneyên ku li gorî metnên jê re hatine xwendin, niha li ser înternetê belav bûne û xelk jî wan wêneyan parve dike.



Mirovên bixwazin, diçin ser malperê û li ser malperê 9 qutî derdikevin pêşiya wan. Xelk nexasim tiştên balkêş yên ku meriv zêde bîra wan nabin, dinivisînin û ji "Dall-E Mini" dixwazin tiştên nivîsandine weke resm ji wan re hazir bike û dûre jî nişanî wan bide.

***Ozgûr Polîtîka***


## Quncika Têgînan

| Bajarok | 1. Bajarê piçûk. 2. Ji gundan mezintir ji navçeyan piçûktir. |
|---|---|
| Cangorî | 1. Xweşmir, pakrewan, canfeda, xwbexş. 2. Kesê ji bo dozekê jiyana xwe dike gorî, fedayî. |
| Çalakvan | Kesê çalakiyan dike, çalakker. |
| Gef | Gotina ji bo tirsandinê, reşdayîn, tehdîd: Rêbiran gef li gundiyan xwarin. |
| Navçe. | Ji bajêr piçûktir, ji bajarok mezintir. |
| Qad | Meydan, ciyê mezin û fireh: Ji bo şermezarkirina dagîrkeran welatî daketin qadan. |
| Xwepêşandan | Komek mirov ku ji bo şermezarkirina tiştekê li ciyekî helwesta xwe diyar dikin. Xwenîşandan: Ji bo dijberiya bihabûna benzînê welatiyan xwepêşandanek li dar xist. |
| Xweşmir | Şehîd, pakrewan, cangorî. |
| Çalakî | Bizav, xebat, liv, lebat, tevger, hereket, kiryar, kar, kirin: Ji bo bîranîna şehîdan çalakiyek hat lidarxistin. |
| Çalak | Çeleng, jîr, jêhatî, xurt, kêrhatî: Xortên gundê me çalak in |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | R | ■ | Ç | ■ | N | İ | G | A | R |
| 2 | E | B | E | D | İ | ■ | A | ■ | E |
| 3 | ■ | Ê | L | ■ | S | O | R | A | N |
| 4 | G | ■ | P | K | K | ■ | A | ■ | Î |
| 5 | A | J | ■ | Î | ■ | K | N | K | ■ |
| 6 | ■ | Î | D | ■ | T | A | ■ | A | R |
| 7 | D | ■ | O | J | E | ■ | A | L | A |
| 8 | A | X | ■ | Ê | ■ | Î | R | O | ■ |
| 9 | X | W | E | ■ | E | N | Î | ■ | |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Cînava pirsê ya tê wateya; li kû ye?... Birayê bavê mirov... Pirç
2. Baneşana ga pê tê ajotin û sekinandin... Deng, sewt
3. Danekî rojê... Du roj beriya niha
4. Notayek... Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye
5. Peyva neyînî... Sedemkarê tevgerê, paldêr
6. Kesê di keştiyan de xizmeta rêwiyan dike
7. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku sembola hêzê bi kar tînin... Agir
8. Notayek... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe hatiye tinekirin
9. Baneşana kêfxweşiyê... Riya teng a ku tenê bi piyan tê de tê meşandin

**JOR-JÊR**

1. Alî... Bajarekî me
2. Xem û keder
3. Encam, netîce
4. Genimê hêrandî... Kar û xebat
5. Bi soranî 'av'... Paytexta Îtalyayê
6. Serokê rûhanî yê xaçparêzan... Ava qirêj a piştî şûştinê
7. Stranên li ser miriyan... Peyveke teşwîqkirinê
8. Dijbera jêr
9. Nexweşiyek... Keç... Ji wî/ji wê

# Pirsgirêka kamp û girtîgehên DAIŞ`iyan û reva dewletan ji erkê xwe



Doktora qanûna navneteweyî ya Fransî da zanîn ku bakur û rojhilatê Sûriyê ne girtîgeha Guwentenamû ye. Divê dewletên têkildarî doza DAIŞ`ê li peymanên imze kirîn, xwedî derkevin; yan welatiyên xwe vegerînin yan alîkariya hiqûqî, siyasî û lojistîk bidin Rêveberiya Xweser...***R-5***

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 971 | 15-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# `LI HEMBERÎ ÊRIŞÊ WÊ BERXWEDANEKE BÊHEMPA BÊ KIRIN`

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD), Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bi daxuyaniyekê encamnameya civîna sêalî ya hevbeş eşkere kirin. Li gorî daxuyaniyê, rêveberiya QSD`ê teqez kir ku, eger dewleta tirkî êrişî herêmê bike ew amade ye, tevayiya tedbîrên parastinê girtine û hêza xwe ya berxwedanê xurt kiriye...***R-2***




## Zeyd El-Eyûbî: Erdogan li ser aştî û ewleyiya navneteweyî dîktatorekî xeternak e



Parêzer û nivîskarê siyasî yê filistînî Zeyd El-Eyûbî da zanîn ku Erdogan li ser aştî û ewleyiya navneteweyî dîktatorekî xeternak e û ji bo hesabxwestina ji dewleta tirkî ya dagîrker du xalên sereke destnîşan kirin...***R-4***

## Dayîka Emîne: Rêber Ocalan em fêrî têkoşînê kirin



"Bi jinên fedekar yên weke te wê gelê me azadiyê bi dest bixe". Dayîka bi navê Emîne ku dayîka 2 şehîdan e, ev gotina rêber Abdullah Ocalan jê re gotî bîr xist û hêvî kir ku careke din rêber Abdullah Ocalan bibîne...***R-2***

## Akademiya Ş.Egîd Cîlo ya Branşan derfetên pêşxistinê diafirînê



Dewreyên perwerdeyê yên mamosteyan li Akademiya Şehîd Egîd Cîlo ya Branşan, bênavber dewam dikin. Armanca wê amadekirina mamosteyên pispor e. ***R-6***

## 'Destek tenê deng jê nayê'

Têkildarî êrişên artêşa Tirkan ya dagîrker yên ser Herêmên Parastinê yên Medyayê û bakur û rojhilatê Sûriyê, welatî nerazîbûna xwe nîşan didin. ***R-7***



Ji bo dijberiyê di nava... Dilyar Cizîrî R-4
Divê Rûsya li hemberî... Zekî Bedran R-5
Pêwendiyeke xweş Sîpan Şînda R-7

# Dayîka Emîne: Rêber Ocalan em fêrî têkoşînê kirin

"Bi jinên fedekar yên weke te wê gelê me azadiyê bi dest bixe". Dayîka bi navê Emîne ku dayîka 2 şehîdan e, ev gotina rêber Abdullah Ocalan jê re gotî bîr xist û hêvî kir ku careke din rêber Abdullah Ocalan bibîne.



Fikir û felsefeya rêber Ocalan hişt ku jin ji bo azadiya xwe berê xwe bidin xebat û têkoşînê. Rêber Abdullah Ocalan dema ku li Sûriyê bû bandoreke mezin li ser jinan kir ku bi wî re civiyan. Heta niha jî jinên ku rêber Ocalan dîtine behsa hevdîtinê dikin weke ku duh pêk hatiye.

Nîqaşa çend saetan bi rêbertî re, rê li ber jinan vekir ku ji bo azadiya civaka xwe dest bi têkoşînê bikin. Rêber Ocalan her dem azadiya civakê bi azadiya jinê ve girê dide. Rêber Abdullah Ocalan di parêznameya xwe ya 5'an "Manefêstoya şaristaniya demokratîk" de dibêje: "Ez dibînim ku doza sereke ya şoreşê, bi taybet a şoreşa Kurdistanê, lêkolînkirina jiyana jinan e, ev doz çareseriya gelek dozan di nav de doza aştiyê jî pêk tîne."

Dayika bi navê Emîne Reşîd ku dayika du şehîdên HPG`ê ye Nesredîn Silêman (Siyamend) ku li Zapê sala 1995`an şehîd bûye û Xeyredîn Silêman (Rustem) ku li Avaşînê sala 1997`an şehîd bûye. Her wiha yek ji jinên ku bi rêber Ocalan re hevdîtin kiriye û li ser fikrên Ocalan xwe bi rêxistin kiriye.

**`Şoreşa me şoreşa jinê ye`**

Dayika Emîne di navbera salên 1992-1994`an de li Şamê bi rêber Abdullah Ocalan re hevdîtin pêk aniye. Dayika Emîne wiha behsa hevdîtina xwe bi rêber Ocalan re kir: "Em 3 jin bûn, rêber Ocalan pêşwaziya me kir û got, "şoreşa me şoreşa jinê ye", dema em jinê azad bikin em ê rewşa civakê baştir bikin. Em ê ji bo doz û rizgarkirina welatê xwe de di rêya rast de bimeşin."

Dayika Emîne dema ku ji rêber Ocalan re dibêje, "ez dayika 2 gerîla me" rêber Ocalan wiha bersiva wê dide: "Bi dayikên mîna te fedekar, dê gelê me azad bibe, zarokên te yên mezin dê rêya xwişk û birayên xwe ronî bikin, heta ku dayikên weke te hebin dê rêyên girtî li pêşiya gelê me vebin."

Dayika Emîne diyar kir ku rêber Ocalan di wê hevdîtinê de behsa damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) û fedekariyên şehîdên destpêkê weke şehîd Mezlûm û şehîd Hakî Kerar, her wiha azadiya jinan û rola jinê di avakirina civakê de kir.

**"Azadiya Rêber Ocalan azadiya hemû gelan e"**

Dayika Emîne behsa hevkariya bi hevjînê xwe re ji bo meşandina kar û xebatên partiyê û bandora rêber Ocalan li ser kesayeta xwe kir û got: "Êdî li civatan, min bi zilaman re nîqaş dikir û behsa rola gelê xwe dikir."

Dayika Emîne vegotina serpêhatiya xwe wiha berdewam kir: "Dema serdana goristanên şehîdan dikim, bi hezaran gorên şehîdan ên canê xwe ji bo doz û rêberê xwe feda kirine dibînim, wê demê fêm dikim ku êdî şoreşa rêbertî bûye rastiyek ku gelê me têgihiştiyê. Gelê me dê hemû armancên xwe pêk bîne."

Dayika Emîne Reşîd bang li gelên herêmê bi taybet gelê Kurd kir ku ji bo bidawîkirina tecrîda li ser rêber Ocalan dakevin qadan û got: "Çiqas em ji bo rêbertî kar bikin dê li hember fedakariyên rêber û şehîdên kêm bin. Azadiya rêber Ocalan azadiya gelê Kurd e û tevahî gelên herêmê ye."

Dayika Emîne Reşîd hêvî kir ku careke din karibe bi rêber Ocalan re bicive û teqez kir ku ew ji bo rêbertî amade ne fedekarî bikin û dê her tim şopdarên rêya şehîdên xwe bin.

***ANHA***

# Endama Koordînasyona Kongreya Star: PDK planên dewleta tirkî ya dagîrker pêk tîne



**Endama Koordînasyona Kongreya Star diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker hewl dide gelê Kurd qir bike û hevkariya PDK'ê bi dewleta tirkî re bi armanca temamkirina planên dagîrkeriyê bi nav kir.**

Ji 17'ê Nîsanê ve gerîlayên HPG û YJA Starê li herêmên Avaşîn û Metînayê li hember êrişên artêşa Tirk a dagirker berxwedaneke bê hempa didin meşandin.

Beriya çend rojan HPG'ê hişyarî dabû ku PDK'ê amadekariyan dike tev li nava "Cenga dîrokî" ya di navbera gelê Kurd û dagirkeriya Tirk de bibe.

HPG'ê bang li hêzên siyasî, rewşenbîr, hunermend û saziyên niştîmanî yên Başûrê Kurdistanê kiribû ku li hember rûdana êrişeke wiha bi erkên xwe rabin.

Di vê çarçoveyê de endama Koordînasyona Kongra Star Eyşe Mehmûd hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re şermezar kir û berxwedana gerîla silav kir.

**"Dewleta tirkî li derfetekê digere ku gelê Kurd qir bike"**

Endama Koordînasyona Kongra Star Eyşe Mehmûd diyar kir ku dewleta Tirk ti derfetê ji bo qirkirina gelê Kurd ji dest nade û got: "Lê hevkariya PDK'ê ya bi dewleta Tirk a dagirker di girtina aliyê başûr ê herêma Metînayê ji bo temamkirina planên bi sûc ên dewleta Tirk a dagirker a PDK'ê ye. Bi vê yekê PDK'ê beşdarî pêvajoya qirkirinê dibe."

Eyşe Mehmûd destnîşan kir ku Ji ber ku PDK'ê dibîne îdeolojiya Tevgera Azadiya Kurdistanê ne li gor berjewendiyên wê ye, bi dewleta Tirk a dagirker re hevkariyê dike û li ser Tevgera Azadiya Kurdistanê dorpêçê ferz dike.

Eyşe Mehmûd hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirk re bi xiyanet bi nav kir û got: "Em baş nas dikin ku dewleta Tirk dijmina dîrokî ya gelê Kurd e, me dît ji bo qirkirina gelê Kurd çi kir û çi dike, dixwaze xîlafeta Osmanî careke din ava bike, lê dixwaze bi rengekî berfiretir li Rojhilata Navîn desthilat û hegemoniya xwe ferz bike."

**"Divê hêzên kurdî li hember dagirkeriyê helwest nîşan bidin"**

Eyşe Mehmûd diyar kir ku hevkariya PDK'ê dewleta Tirk re nakeve xizmeta gelê Kurd û Başûrê Kurdistanê bi taybet û bang li Kurd kir ku li hember dagirkeriya Tirk û planên wê yên dagirkeriyê helwesta xwe eşkere bikin.

Endama Koordînasyona Kongra Star diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker hewl dide di nava aliyên kurdî de fitne derbixîne û got: "Divê em ji van hewldanan hişyar bin, em nekevin dava dewleta Tirk. Divê gelê Kurd li çar aliyên Kurdistanê hewlestekê nîşan bide û yekitiya xwe ava bikin da ku bighêjin aştiyeke mayînde."

Eyşe Mehmûd da zanîn ku bi nêzbûna dawîbûna peymana Lozan û hilbijartinên li Tirkiyê gelê Kurd di rewşeke zehmet re derbas dibe û bang li gelê Kurd kir ku dûr berjewendiyên partî bikeve û berjewendiyên xwe biparêze.

Eyşe Mehmûd hişyarî da ku eger PDK'ê di siyasetên xwe de dewam kir dê gelê Kurd destkeftiyên xwe ji dest bide û got, divê destkeftiyên gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê û Herêmên Parastinê yên Medyayê bên parastin.

Der barê şêwazên xweparastina li hember êrişên dagirkeriyê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî de endama Koordînasyona Kongra Star got: "Divê civak û jin bên hişyarkirin û li gor pîvanên parastina cewherî û parastina rewa amadekariya bersivdayîna êrişan bê kirin.''

Eyşe Mehmûd bang li hemû jinên siyasetmedar û hiqûqnas ên Kurdisanê kir ku xwedî helwest bin û ji bo çareserkirina nakokiyên kurdî yekitiya xwe ava bikin û wiha anî ziman: "Aştî bi destê jinê pêk tê."

Endama Koordînasyona Kongra Star Eyşe Mehmûd bang li hêzên kurdistanî kir ku bi PDK'ê re bicivin û ji wê bixwaze ku hevkariya bi dijminê kurdan re terik bike.

***ANHA***

# Ji Kombûna Jinan ya Zenûbya pêngava hişyarkirinê

**Kombûna Jinan ya Zenûbya bi dirûşma "Bi rêxistin û perwerdeyê emê şoreşa civakî pêk bînin", pêngava hişyarkirinê ragihand.**

Kombûna Jinan a Zenûbya bi beşdariya bi dehan endamên saziyên sivîl û leşkerî yên Reqayê, bi daxuyaniyekê pêngaveke civînên giştî bi armanca danasîna pirsgirêkên civakî yên ku rastî jinan tên û çareseriyên wan, ragihand.

Berdevka Kombûnê Xûd Îsa daxuyanî xwend ku tê de behsa pirsgirêkên civakî yên rastî jinan tên, hat kirin; "Zêdebûna rêjeya xwekuştinê, zewicandina zarokan, pirjinî, şerê taybet û tinebûna wekheviyê, tundiya li ser jinan, zextên derûnî, bikaranîna madeyên hişbirê û kevneşopiyên şaş".

Hate gotin ku ev pirsgirêk civakê ber tu tunebûnê ve dibe.

Her wiha di daxuyaniyê de çareserî ji wan pirsgirêkan re hatin destnîşankirin û wiha hate gotin: "Divê em ji bo perwerdekirina civakê bixebitin û giraniyê bidin rola malbat û dibistanê di perwerdeyê de, rê nedin zewicandina zarokan û xelkê teşwîqî fêrbûna nivîsandin û xwendinê bikin.''

Kombûna Jinan a Zenûbya di daxuyaniya xwe de ragihand ku ew ê bi dirûşmeya "Bi rêxistin û perwerdeyê em ê şoreşa civakî pêk bînin", dest bi pêngava civînên giştî bikin ku dê heta 9'ê Tîrmeha bê bidome.



Li gor daxuyaniyê, pêngav dê li her çar herêmên rêveberiyên sivîl li Reqa, Tebqa, Minbic û Dêrazorê were lidarxistin.

***ANHA***



# 'Destek tenê deng jê nayê'

Têkildarî êrişên artêşa Tirkan ya dagîrker yên ser Herêmên Parastinê yên Medyayê û bakur û rojhilatê Sûriyê, welatî nerazîbûna xwe nîşan didin.



Têkildarî êrişên artêşa Tirk a dagirker ên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, welatî nerazîbûnên xwe nîşan didin. Endam û rêveberên Navenda Baqî Xido ya Çand û Huner a bajarê Kobanê jî bi vî awayî nerazîbûnên xwe tînin ziman.

Helbestvan Mihemed Misê (Hemê Kobanê); "Di dîrokê de dewleta Tirk a dagirker li ser bingehê hişmendiya dagirker û faşîst hatiye avakirin. Lewre dixwaze li her derê gelê Kurd qir bike. Erdogan li Ukraynayê xwe wekî parêzvanê aştiyê dide xuyakirin her wiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Kurdistanê şer û wêrankirinê dike. Çiqasî dewleta Tirk a dagirker li herêman û çiyayên Kurdistanê êrişî gelê Kurd bike jî ew ê bi bin bikeve, ji ber ku gelê me xurt e û li ser bingehê fikir û felsefeya rêber Abdullah Ocalan xwe bi rêxistin dike."

**'Emê xwe nespêrên hêzên derve'**

Lîstikvana şanoyê Leyla Ehmed jî got, "Dewleta Tirk a dagirker bi çekên giran û kîmyewî êrişî herêmên Kurdan ên Başûrê Kurdistanê dike, ruxmî dizane çekên qedexekirî çiqasî bandorê li mirovahiyê, sewal û nebatan dike, lê bi kar tîne. Li dijî van êrişan em ê xwe ti carî nespêrin hêzên derve û em ê hewl bidin aştiyê misoger bikin."

**'Destek bi tenê li çepikan naxe'**

Hunermend Henîf Ismet; "Li dijî me komployek heye û şerê li dijî çiyayên Kurdistanê qirkirina çanda Kurdî dike armanc, lê çi bikin jî ew ê bi ser nekevin ji ber ku Kurd wekî daran e her ku çiqilkek hate jêkirin bi sedan şax didin. Helbet ti kes wê parastina me neke, berovajî wê ew ê ji her aliyî ve êrişî me bikin. Lewma ez dibêjim, destek bi tenê li çepika naxe û divê li hember van êrişan, em hevgirtina xwe ava bikin."

**'Wijdanê cîhanê hişyar bikin'**

Hunermend û endamê Koma Botan a Navenda Baqî Xido ya Çand û Huner Henîf Osman jî got, "Divê hunermend îro piştgiriya gelê xwe bike û wijdanê cîhanê li ser destana Kurd a li dijî dijminan dinivîse, hişyar bikin." Osman got, li her çar parçeyên Kurdistanê hunermend girêdayî şoreşê ne û ji erka wan e li dijî dijmin, piştgiriya şoreşa Kurdan bikin, ji ber ku ew xwediyê doz û xakê ne.

***ANHA/KOBANÊ***

# Li dibistanên Kurdistanê polîtîkayên qirêj



**Li bajarên bakurê Kurdistanê polîtîkayên şer bi awayekî sîstematîk her dewam dikin. Nexasim jî jin, ciwan û zarok dibin hedefa van polîtîkayên qirêj.**

Li bajarên bakurê Kurdistanê polîtîkayên şer bi awayekî sîstematîk her dewam dikin. Nexasim jî jin, ciwan û zarok dibin hedefa van polîtîkayên qirêj. Li dibistanên ku kirine parçeyekî polîtîkayên şerê taybet, xwendekar ji aliyê mamoste û îdareyê ve tên tacîzkirin û heta dest diavêjin van zarokan. Li aliyê din jî bi madeyên hişbir yên li ber dibistanan tên firotin, ciwanan dikin bin lepê xwe.

Li Êlih, Amed, Şirnex, Sêrt, Riha û Wanê jî li ber dibsitanan hişbir tê firotin û gef li xwendekaran tê xwarin. Rayedar gelek caran tiştên li ber dibistanan diqewimin înkar dikin û dibêjin, tiştekî wiha tine ye.

Lê sala 2019'an derketibû holê ku li navçeya Şirnexê Cizîrê, li dibistanekê alîgirê midûr û nûnerê Egîtîm Bîr Senê, Burak Ercan dest dirêjî 40 xwendekaran kiribûn û di dozê de dadgehê 22 meh û 15 roj cezayê girtîgehê dabû wan. Li aliyê din li dibistaneke gundê Pîranê ya Amedê, Diyadîn B. yê 8 sal bû mamostetî dikir, xwendekar îstîsmar kiribûn û ev dest dirêjiyên wan bi riya nûçeyên ajansan hatibûn deşîfre kirin.

Hevseroka Şaxa Hejmara Yekê ya Egîtîm Senê ya Amedê Emîne Akşahîn derbarê mijarê de got, tiştên li dibistanan diqewimin nêzîkatiya dewletê nîşan dide.

**'Siberoja zarokan tarî ye'**

Emîneyê got, ji bo zarokan siberojek nayê amadekirin: "Siberoj tarî ye. Pêşî li siberoja zarokan girtine. Malbatan bi xizaniyê terbiye dikin.

Ev bandoreke mezin li ser perwerdeya zarokan dike. Li cihên ku rewşa aborî ne baş e, zarok ba perwerde nabin. Newekheviyek heye. Ligel van li ber dibistanan madeyên hişbir tên firotin. Li hinek deveran bi destê rayedaran ev tê kirin. Hikûmet hewl dide civakê di bin kontrolê de bigire lê çi balkêş e agahiya wan ji tiştên ku li ber dibistan diqewime, tine ye."

Emîneyê got, yek ji wan cihên ku nirxên civakî li wan tên rizandin êdî dibistan in û wiha dewam kir: "Bi polîtîkayên newekheviyê, nirxên civakî yek bi yek dirizin. Divê em nirxên civakî biparêzin û xwedî li wan derkevin. Em dibînin ku ciwanên me dibin qurbanê van polîtîkayan.

Li dibistanan bûyerên îstîsmarê pêk tên. Li ber dibistanan bi zanebûn madeyên hişbir tên firotin. Fuhûş li ciwanan tê ferzkirin. Em bi polîtîkayeke bêcezahiştinê re rû bi rûne. Mirovên dibêjin, em birçî ne, tên binçavkirin û girtin. Lê tecawizkar û kujerên jinan tên berdan."

Emîneyê di dawiya de bang kir ji bo têkoşînê: "Rêveberên vî welatî zimanekî şidetê bi kar tînin. Ji ber vê jî civak xistine bin lepê şidetê. Li herêmê polîtîkayên şerê taybet tên meşandin. Em dixwazin ji bo ciwan û zarokan siberojeke ronî ava bikin."

***JINNEWS***

# Şanoya "Taxa Jibîrkirî" li Qamişlo hat pêşendan

**Di roja duduyan de, Koma Mihemed Şêxo ya şanoyê bi alîkariya Komîna Şanoyê, şanoya bi navê "Taxa Jibîrkirî" li ser dika Navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê li bajarê Qamişlo û bi beşdariya bi dehan welatiyan, pêşkêş kir.**

Kawa Kawa Fetah û Ednan Mistefa şano nivîsandiye û derhênertiya wê kiriye. Tê de 16 şanoger dilîzin. Di nav de zarok jî hene.

Şano bi şêwazeke komîdî hate pêşendan, navaroka wê têkildarî girîngiya hevgirtin û yekitiyê û di şer û kirîzan de çawa mirov xwe bispêre xwe û serî netewîne, ye.

Derhênerê şanoyê Kawa Fetah diyar kir ku wan bi rêya wê şanoyê hewl da ku bal bikişînin ser reftarî û tevgerên neyînî wek dizî, bêkarî û nerastiyê, her wiha rola neyînî ya pergalên genedelî ku di şanoyê de muxtar wê temsîl dike.



Fetah her wiha destnîşan kir ku şano girîngiya rola mamoste û perwerdehiyê di têkbirina nerastî û paşverûtiyê de, nîşan dide.

Lîstokvan Dilcan Oso diyar kir ku amadekariya şanoyê heta 2 mehan dom kir û nameya wan a sereke ji wê şanoyê ew e ku mirov xwe bispêre xwe, yekitî û hevgirtinê di nav civakê de ava bibe.

***ANHA***



## Pêwendiyeke xweş

Sîpan Şînda

Em bi derbûmeseleyekê dest pê bikin. Dibêjin rojekê padîşahek ji wezîrê xwe aciz dibe û lê dikeve hêcetan da ku serê wî jê bike. Di koçka xwe de jê re dibêje divê tu ji min re tiştekê bînî di vê dinnyayê de ne jê xweştir û şirîntir hebe û ne jî jê tehltir û nexweştir hebe. Wezîr dizane ku padîşah lê ketiye hêcetan û dibêje bila ezbenî û bi dilekî kul ji koçkê derdikeve û berê xwe dide malê. Gelekî hizrê xwe dike, diçe li cem çend zana û aqilmendên li wî welatî hene digere û derdê xwe ji wan re dibêje. Lê ti kes bersiveke ku wî ji mirinê xilas bike nade wî. Dîsa vedigere malê. Jina wî dibîne ku ew gelekî xemgîn û bêmehd e. Jê re dibêje te xêr e camêr, ka çi derdê te heye tu hinde xemgîn î? Ew jî meseleya xwe û padîşahî jê re dibêje. Jina wî jê re dibêje ezê şîretekê li te bikim, heke tu bi ya min bikî tuyê ji mirinê xilas bibî. Ew jî dibêje bila. Jinik dibêje ka tu here pezekê bîne ser jê bike. Wezîr şaqis dimîne. Lê ti çareya wî nebûye û ew diçe pezekê tîne ser jê dike. Jinik goştê wê dipijîne û tejî sînîyekê goşt dike û zimanê pez jî datîne ser goştî. Dibêje here vê ji pedîşahê xwe re bibe û bêje heke wî tiştek him ji zimanî xweştir û şirîntir û him jî jê nexweştir û tehltir dît bila hingê serê te jê bike. Wezîr jî bi ya jina xwe dike û sîniya goştî dibe û diçe cem padîşahê xwe. Padîşah dibêje wezîrî tu hatî? Dibêje belê ezbenî. Dibêje ka te bersiva pirsa min anî? Dibêje belê ezbenî. Padîşah gazî celadî dike û tîne wê derê. Dibêje wezîrî deka ji min re jî bêje, ez gelek mereq dikim. Wezîr sîniya goştî datîne ber wî û dibêje ezbenî bersiva pirsa te ev zimanê ha ye. Ez li vê dinyayê hemûyê geriyam û min tiştek ji zimanî hem xweştir û şirîntir û hem jî nexweştir tehltir nedît. Padîşah matmayî dimîne û jê re dibêje tu rast dibêjî wezîr. Ya rast ez li bendê bûm ku serê te jê bikim, lêbelê te bersiva herî rast anî.

Belê zimanekî xweş mifteya çareserkirina hemû pirsgirêkan e.

Di jiyanê de tiştek nîne ku mirov bi pêwendiyê careser neke. Çi di hevaltiyê de be, çi di jin û mêrantiyê de be, çi di navbera dê û bava û zarokan de be mirov bi pêwendiyeke xweş dikare hemû pirsgirêkên xwe çareser bike. Bi taybetî di navbera jin û mêran de gelek pirsgirêkên kiçik bi pêwendiyeke hişk vediguherin pirsgirêkên mezin û têkiliyan dixetimîne. Ji ber ku ew nizanin ka wê çawa nêzîkî pirsgirêkê bibin û ji bo pirsgirêkê careser bikin jî bi pirranî erênî hizir nakin û pitirê xwe dikevin rikê hev. Her yek dibêje divê tu li ber min bidî nîrê nivz û dikevin di xeterê. Di rastiyê de peyvek yan jî lebatek dikare wê pirsgirêkê çareser bike, lê mixabin derûniya wan ji bo vê ne guncaw e. Her yek dibêje ez heq im û aliyê din neheq e, nêrîna min û nêzîkbûna min rast e, ya aliyê din şaş e. Halbiku ne hewce ye kes li ber kesî bide nîrê nivz, ji bo pirsgirêkê çareser bikin pêdiviya wan tenê bi peyv, liv û nêzîkbûnên rast heye. Hev fêmnekirin û xwenexistina şûna hev de pêwendiyê hişk dike. Qîr û heqaret, xeber û dijûn dil şikandineke neyê cebarkirin bi xwe re tîne. Ne pêkan e ku mirov di hemû mijaran de li hev bike, lê her çi dibe bila bibe divê mirov hewl bide ku nakokiyan bi zimanekî xweş çareser bike. Pêşiyan gotiye, zimanê xweş marî ji kunê derdixe.

# Akademiya Ş.Egîd Cîlo ya Branşan derfetên pêşxistinê diafirînê

Dewreyên perwerdeyê yên mamosteyan li Akademiya şehîd Egîd Cîlo ya Branşan, bênavber dewam dikin. Armanca wê amadekirina mamosteyên pispor e.

**Mihemed Xanim / Qamişlo**

Piştî ragihandina Rêveberiya Xweser ya Demokratîk (21'ê Çileya 2014), Desteyên Perwerde û Fêrkirinê bi pêşxistina warê perwerdeyê li gorî rêgezên Neteweya Demokratîk hatin erkdarkirin. Desteyan kedeke mezin dan û ji sifirê dest pê kirin.
Pergala perwerdeyê ya herêma Cizîrê li gorî rêgezên Neteweya Demokratîk û zimanên gelên herêma Cizîrê ye. (Kurdî, Erebî û Suryanî ) Li herêma Firatê Erebî û Kurdî ye. Ev gav wek gava yekê li Sûriyê tê hesibandin. Desteya





Perwerde û Fêrkirinê di demeke kin de di warê perwerdeyê de xebateke mezin kir û peymangeh, akademî û zanîngeh vekirin. Di sala 2019, an de Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Herêma Cizîrê, Ji bo pêşxistina asta perwedeyê, pisporiya branşên zanistî û wêjeyî, herwiha amadekirina mamosteyan ji bo dayîna perwerdeyê li dibistanan, Akademiya şehîd Egîd Cîlo ya Branşên Kurdî li bajarê Qamişlo vekir û bi dewamî dewreyên perwerdeyê yên mamosteyan li akademiyê bi rê ve diçe.

**Dewreya nû**

Di destpêka meha, 6,an ya sala 2022,an de, Akademiya Şehîd Egîd Cîlo ya Branşên Kurdî li Qamişlo, ji bo pisporiya ya mamosteyan dewreyeke nû vekir û wê mehekê dewam bike. Li ser girîngiya Akademiyê û kar û xebata wê, rêveber û mamosteyên dewreya nû ji me re axivîn.

**'Armanc, bidestxistina şarezayiyên nû û pêşxistina jîriyê ye'**

Ji Rêveberiya Akademiya Şehîd Egîd Cîlo ya Branşên Kurdî Zîlan Îbrahîm diyar kir ku mamosteyên ku tevlî perwerdeya akademiyê dibin, ji bo pisporiya meteryalên zanistî û pedagojî tên amadekirin û axaftina xwe wiha domand: "Armanca vê dewreyê wek dewreyên din yên qediyîn, bidestxistina agahiyên nû yên perwerdeyê, hînkirin, zêdekirin û pêşxistina jîriyên mamosteyan e. Herwiha fêrkirina awayên hînkirin û çawaniya danûstendina li gel xwendekaran e. Ji tevayiya navçeyên herêma Cizîrê mamoste tevlî perewrdeya li akademiyê dibin. Jimara mamosteyên tevlî dewreya nû bûyîn 41 e. Ji destpêka perwerdeyê, mamosteyên tevlî bûyîn dest bi dayîna waneyan dikin, herwiha fêrî rêbazê amadkirina waneyê ya nûjen û rêbazên wanedayînê dibin."

**'Bi rêbazên pêşketî û curbicur wane tên dayîn'**

Herwiha mamoste Sîlva Osman ku endama komisyona branşa zanyariyê ye, da zanîn ku dema perwerdeyê li gorî asta têgihiştina mamosteyên tevlî bûyîn tê diyarkirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wek beşa branşa zanyarî, ji bo mamosteyan em noteyeke akademîk amade dikin. Li gorî têghiştina mamosteyan rêbazê fêrkirinê tê diyarkirin. Dema agahiyên hin mamosteyan lawaz bin yan jî di hin mijaran de kêm bin, em bi riya dîmen ( Vîdyo ) yan jî bi riya tecrûbeyên zanisî wan fêr



dikin. Di akademiyê de, mamoste bi destê xwe tecrûbeyên zanistî li teqîgehan çêdike. Armanca me ew e ku rêbazên pratîkî derbasî dibistanan bibin û teqîgeh li tevayiya dibistanan bên amadekirin. Ji bo fêrkirina beşa zanistî, pîwîstî bi amûrên fêrkirinê heye û tevayiya amûrên zaniastî li vir peyda dibin. Herwiha ji her mamosteykî projeyek tê xwestin û bixwe li ser kar dike. Ji ber wê mamoste di warê zanistî û teknîkî de pêş dikeve."

**'Ji bo serkeftinê perwerde pêwîst e'**

Mamosteyê bi navê Mihemed Badînê ku tevlî perwerdeya branşa erdîngarî li Aakademiya Şehîd Egîd Cîlo bûye, da xuyakirin ku ji bo pêşketina zanist, rêbazên wanedayînê û naskirina amûrên fêrkirinê, pêwîstiya mamosteyan her dem bi perwerdeyê heye û wiha got: "Akademiya Şehîd Egîd Cîlo, ji bo mamosteyan derfeta pêşxyistinê diafrîne. Di perwerdeya li akademiyê de amûrên



nûjen tên bikaranîn. Herwiha ya girîng fêrbûna perwerdenasînê ye, ango mamoste çawa danûstendinê bi xwendekaran re bike û heskirina dibistanê li cem wan çêke. Mamosteyên ku dixwazin serkeftî bin, pêwîst e her dem tevlî perwerdeyê bibin."

# `Kesê zagona paqijiyê binpê bike wê were cezakirin`

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Cîgira Hevserokatiya Desteya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê Bêrîvan Umer da zanîn ku paqijiya jîngehê herî zêde civakê eleqedar dike, ji bo wê pêwîst e civak parastina paqijiya herêma xwe bike. Herwiha got, kesê zagona paqijiyê binpê bike wê were cezakirin.**

Ji bo qedexekirina avêtina çopê ji pencereyên malan û erebeyan, herwiha li kolanên sereke û pişta avayiyan, Desteya Rêveberiya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê destpêka vê heyvê zagoneke nû ragihand, ku cezayê binpêkirina vê zagonê jî heta cezayê girtinê diçe. Herwiha belavokên hişyariyê jî li gel belav kirin.
Desteya Rêveberiya Xwecihî





û Ekolojî ya Herêma Cizîrê bi Rêveberiya Giştî ya Trafîkê û Komeleya Keziyên Kesk ya Jîngehê, 5`ê Hezîranê belavokeke hişyariyê li gel belav kirin. Di belavokê de hişyarî li ser qedexekirina diyardeya avêtina çopê li ser riyan, ji bencereyên malan û erebeyan hatiye kirin. Herwiha zagonek hatiye eşkerekirin û li gorî wê kesên ku gelaşê ji pencereyên malên xwe û erbeyan biavêjin yan jî biavêjin pişta avahiyan wê ceza li wan were birîn. Ceza di cara yekê de wê 25 hezar lîreyên Sûriyê be, eger were dubarekirin wê ceza duqat bibe, cara dawî wê herî kêm mehekê di zindanê de bimîne.
Derbarê belavkirina belavokên hişyariyê û derxistina biryareke nû ya paqijiyê de Cîgira Hevserokê Desteya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê Bêrîvan Umer ji me re axivî û nêrînên xwe anîn ziman.

**`Ev zagon ji bo parastina jîngehê û tenduristiya civakê ye`**

Bêrîvan Umer ddiyar kir ku zagona paqijiyê ji milê meclisa zagonsaz ve hatiye erêkirin û axaftina xwe wiha domand: "kesê ku zagonê binpê bike wê ji aliyê şaredariyê ve were cezakirin. Me ev zagon ji bo hişyarkirina gel derxistiye. Em naxwazin ti kes bigihe asta cezakirinê, çimkî ne bargiraniyek e eger mirov li paqijiya derdora xwe hişyar be. Ev zagon ji bi barastina jîngehê, di serî de parastina tenduristiya civakê ye. Heriwha ji bo ku civak bikeve rastî û baweriya paqijiya jîngehê."
Bêrîvan got, bi hevkariya Tirafîkê û Komeleya Keziyên Kesk me belavok li gel belav kirin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Emê li her devera herêma cizîrê belavokan belav bikin. Emê heta demekê belavokan belav bikin, pişt re emê dest bi cezayan bikin. Di demên pêş de wê ev zagon bibe ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê."



**`Armanc xwedîderketina li paqijiya jîngehê ye`**

Bêrîvan diyar kir ku pirsgrêka herî mezin li herêmê qirêjbûn e û wiha pê da çû: "Ji ber ku qirêja li herêmê zêde bûbû û çanda parastina jîngehê di nava civakê de kêm bû me xwest em pêşî li vê qirêjiyê bigirin û çanda paqijiyê di nava gel de belav bikin. Jixwe armanc ji vê zagonê ew e ku gel parastina paqijiya jîngeha xwe bike û lê xwedî derkeve. Bi taybetî di dema havînê de, çimkî di havînê de germayî zêde ye. Dema çop li ber tavê dimîne bêhna wê derdikeve û sewal jî wê çopê belav dikin. Ev tev dibin sedema nexweşiyên nû û zirarê li jiyana mirovên li jîngehê dike. Ji bo wê jî em hewl didin ku paqjî li herêmên me zêde bibe. Da em jiyana xwe û ya kesên derdora xwe biparêzin."



Bêrîvan bîr xist ku pêngavên wan yên ji bo paqijiya jîngehê dewam dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Pêngavên me li nava bajêr û derveyî bajêr hene. Herwih cihê ku xweza lê hebe em parastina paqijî û darên lê dikin û darên nû jî lê diçînin. Ji bilî pêngav, proje û zagonan em semînerên derbarê paqijiyê de jî didin."
Cîgira Hevserokatiya Desteya Xwecihî û Ekolojî ya Herêma Cizîrê Bêrîvan Umer di dawiyê de bang li gel kir ku xwedî li pêngav û zagonên paqijiyê dekevin. Herwiha got, kar û xebata me tev ji bo gel e. Pêwîst e gel jî parastina çanda paqijiyê bike. Da em bajarekî paqij û ewle ava bikin.



# Encamnameya civîna MSD, QSD û Rêveberiya Xweser hat eşkerekirin

MSD, QSD û Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê encama civîna sêalî ya hevbeş ku piştî gefên dewleta Tirkan ya dagîrker hatibû lidarxistin, eşkere kirin.

Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD), Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê encamnameya civîna sêalî ya hevbeş ku li Hesekê hatibû lidarxistin, eşkere kir.
Li gorî daxuyaniyê, rêveberiya QSD`ê teqez kir ku heke êrişeke muhtemel a dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmê pêk were, ew amade ye û tevahiya tedbîrên meydanî girtine û hêza xwe ya berxwedanê heta demeke dirêj xurt kiriye.
Her sê aliyan di encamanmeyê de diyarkirin ku ji encamên êrişê û sînordarkirina hewldanên QSD`ê ya berdewamkirina têkoşînê li djî terora DAIŞ`ê hişyarî da û diyar kir ku ev yek dê rê li pêşiya DAIŞ`ê veke ku careke din çalak be û ewlehiya neteweyî bixe xeteriyê. Her wiha her sê aliyan bang li şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku hevgirtî bin, li hember projeyên li dijî ewlehiya wan û pêşeroja wan li ber xwe bidin. Her sê aliyan, teqez kir ku rêya yekane ya binxistina dagirkeriyê û projeyên wê, yekitî ye.
MSD, QSD û Rêveberiya Xweser destnîşan kirin ku gefên dewleta Tirk xeteriyeke mezin e û bang li hemû hêzên nîştimanî yên demokratîk li Sûriyê kir ku van gefan red bikin. Her wiha bang li Komkara Erebî û Meclisa Hevkariya Kendavê kirin ku li hember terorê destekê bidin sûriyan, dagirkeriya Tirk a li ser Sûriyê red bikin ji ber ku armanc dike axa Sûriyê parçe bike û dagir bike.
Encamname wiha ye: "Di 11`ê Hezîrana 2022`yan de, bi beşdarbûna Fermandariya Giştî ya QSD, rêveberiya MSD û hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser, bi armanca nirxandina rewşa heyî û geşedanên dawîn li herêmê, gefên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmê û helwestên hêzên navneteweyî û rêbazên têkbirina van gefan, civîneke awarte ya hevbeş li dar xist.
Di civînê de Fermandariya QSD`ê şert û mercên navneteweyî, zêdekirina asta êrişên dewleta Tirk ên li dijî herêmên Til Temir, Zirgan, Minbic, Kobanê û Şehba bi hurgilî şîrove kirin. Her wiha fermandariyê, şert û mercên navneteweyî yên dawîn, bandora wê, hewldanên hikumeta Tirkiyê ku dixwaze ji nakokiyan sûdê bigire, şîrove kirin. Fermandariyê teqez kir ku ew amade ye û hemû tedbîrên meydanî girtine da ku heta demeke dirêj li ber xwe bide. Beşdaran destnîşan kir ku her êrişeke ji aliyê dewleta Tirk ve bi hemû awayî tê şermezarkirin û diyar kir ku dewleta Tirk armanc dike beşên din ên erdnîgariya Sûriyê dagir bike. Dê ev yek bi xwe re karesateke mirovî ya din bîne. Beşdaran hişyarî da ku ev êriş, dê hewldanên QSD`ê ya ji bo berdewamkirina têkoşîna li dijî terorê sînordar bike. Mijulbûna QSD`ê bi vê êrişê re li bakur derfetê dide ku DAIŞ careke din şaneyên xwe çalak bike û ewlehiya navneteweyî careke din bixe xeteriyê. Dê destwerdana dewleta Tirk herêmê ji nû ve bike qubleya hêzên tundraw. Her wiha dê encamên vê destwerdanê li ser rewşa mirovî wêranker be û dê karesateke rastîn pêk bîne û dê pêleke mezin a koçberiyê çêbibe. Ev yek dê rewa mirovî ya herêmê aloztir bike. Dê hewldan û însiyatîfên pêkanîna çareseriyeke siyasî li Sûriyê li gorî biryarên navneteweyî yên têkildarî têk bibe. Beşdaran teqezî bi girîngiya hewldanên dîplomatîk û cidîbûna helwestên navneteweyî kir ku dikarin rê nedin vê destwerdanê û nebin sedema windabûna firsenda aştiyê û xurttirkirina ewlehiyê li herêmên ji DAIŞ`ê rizgar bûne. Dewleta Tirk hewl dide binkeftina xwe ya dîplomatîk, di nava gelê Tirkiyê de û aloziya aborî li ser hesabê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê derbas bike. Beşdaran bang kir ku divê hêzên navneteweyî daxwazên dewleta Tirk qebûl nekin ku hewl dide wan îqna bike ku hemleya li dijî herêmê dê sînordar û demkurt be. Lê hemû hemleyên wê yên berê jî qaşo sînodar bûn,



di encamê de bi milyonan şênî ji warên xwe koçber bûn.
Beşdaran îşaret bi girîngiya rola pêkhateyên herêmê, êlan, hêz û partiyan kir û diyar kir ku pêkhateyên herêmê di hemû şert û mercên dijwar de bi lehengî li ber xwe dan, axa xwe bernedan, jiyana bi rûmet li welatê xwe dan pêşiya her tişî, her wiha qebûl nekirin ku di destê dagirkeriyê de bibin amûr. Beşdaran bang li şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir ku li hember projeyên li dijî ewlehî û pêşeroja wan, hevgirtî bin. Ji ber rêya yekane ya têkbirina wan planan, vîna gelan e ku bûn yek.
Beşdaran gefên dewleta Tirk bi xeteriyeke mezin bi nav kir, ji ber wê divê hemû hêzên sûrî û sûrî di nav de Artêşa Sûriyê bi hev re bi yekrêzî li hember van êrişan bisekinin. Nexasim ku di cewherê xwe de yekitiya Sûriyê û têkbirina nirxên jiyana hevbeş di navbera gelan de dike hedef.
Di dawiyê de beşdaran, bang li hêzên nîştimanî yên demokratîk li Sûriyê kir ku helwest nîşan bidin û dagirkeriya Tirk red bikin. Her wiha bang li Komkara Erebî û Meclisa Hevkariyê ya Kendavê kir ku piştgiriyê bidin sûriyan di şerê wan a li dijî terorê de û dagirkeriya Tirk a li ser welatê xwe red bikin. Ji ber ku armanca vê projeyê, dagirkirina beşên din ên axa Sûriyê, parçekirina gelê wê û veguherandina bakurê wê dikek girêdayî Tirkiyê ku bi rêya wê gef li ewlehiya herêmê bi giştî bixwe. Beşdaran bang li saziyên navneteweyî û hiqûqî kir ku siyastên dewleta Tirk a dagirker û binpêkirina peymanên navneteweyî bişopînin. Di nav de koçberiya bi zorê, bicihkirin û dagirkirina wêranker heye. Her wiha diyar kirin ku divê ev hêz, helwestên cidî û pratîk nîşan bidin. Beşdaran li ser pêwîstiya lîstina roleke girîng ji aliyê hêz û saziyên civakî û sivîl ve teqez kir da ku hevgirtina di navbera hemû aliyan de li hember van sûcan xurttir be. ''

***ANHA***

## Bûyerên xeniqîna zarokan zêde bûye, hêzên ewlekariyê hişyarî dan

**Hêzên Ewlekariya Hundir derbarê zêdebûna bûyerên xeniqîna zarokan di dema melevaniyê de hişyarî dan û ji welatiyan xwestin ku çavdêriya zarokên xwe bikin.**

Hêzên Ewlekariya Hundir ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê der barê zêdebûna bûyerên xeniqîna zarokan di dema melevaniyê de daxuyanî da û ji şêniya xweset ku çavdêriya zarokên xwe bikin û pêdiviyên melevaniyê ji bo wan peyda bikin.
Di daxuyaniyê wiha hat gotin:
"Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî pêleke dijwar a germahiyê tê, ji ber wê ciwan û zarok berê xwe didin çem û golan û melevaniyê dikin.
Di vê mehê de gelek bûyerên xeniqînê hatine tomarkirin û piraniya wan jî zarok in, ji ber wê em banga hişyariyê di dema melavaniyê dikin û ji sermiyanan dixwazin ku zarokên xwe yên ku nizanin melevaniyê bikin ji metirsiya xeniqînê hişyar bikin.
Em weke Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji şêniyan dixwazin ku tedbîran bigirin, çavdêriya zarokên xwe bikin û pêdiviyên melevaniyê ji wan peydar bikin da ku rewşên wiha dubare nebin û saxlemiya zarokan bê misogerkirin."

***ANHA***

## 'Ji ber nebûna zelaliyê xelkê herêmê dixwaze hatina herêmê radestî Bexda were kirin'

Parlamenterê Herêma Kurdistanê Şaxewan Reuf got, eger biryara Dadgeha Federal ya li ser nefta herêmê pêk bê, di warê neteweyî û nîştimanî de, wê Kurd 100 gavî paş ve biçin. Parlamenter dibêje; "Ji ber ku dosya nefta li Kurdistanê ne zelal e û bi aweyekî wekhev nayê belavkirin, xelk dixwazin hatina herêmê radestî Bexda were kirin."
Di Sibata 2022'an de Dadgeha Federal ya Iraqê yasaya neft û gazê ya herêmê bi ne destûrî bi nav kir. Dadgehê ragihand ku firotina neftê ji aliyê Herêma Kurdistanê ne yasayî ye.
Parlamenterê Fraksiyona Tevgera Goran ya li Parlamentoya Herêma Kurdistanê Şaxewan Reuf derbarê mijarê de ji RojNews re axivî.
Şaxewan got ku di dema borî de dosya neftê li Herêma Kurdistanê ne şefaf bû, ev jî bû sedem ku bi çavek guman li dosya neftê were nêrîn û wiha pêde çû; "Lê niha herêm di rewşek wiha deye ku divê hikumet kar li ser gumanên heyî bike û qeneetê bide Hikumeta Iraqê ku di rêvebirina dosya û belavkirina neftê ya ser bi welatiyan de şefafî heye."
Parlamenter Şaxewan di dewama axaftina xwe de balkêşa ser biryara Dadgeha Federal ya Iraqê ya li ser nefta herêmê û wiha axivî; "Biryara Dadgeha Federal ya Iraqê ji du beşan pêktê, beşek siyasiye û peywendiya xwe bi pêşbaziya siyasî ya di navbera Hewlêr û Bexdayê de heye. Beşa din jî peywendiya xwe bi berhemhênan û firotina neftê ku ji aliyê Hikumeta Herêmê ve ku gumanek zêde li ser heyeve, girêdaye. Ji ber ku di dema borî de di proseya neftê de şefaftî nebû, gilî û gazindên zêde li ser hebûn. Ger Dadgeha Federal li ser wergirtina dosya nefta herêmê bi israr be, wê ziyanek mezin bigihi Hikumeta Herêmê û xelkê Kurdistanê. Ji bo vê nabe Hikumeta Herêmê li ser vî şêwazê xwe yê rêvebirina dosya neftê dewam bike. Pêwîstî bi şefafî û wekheviyê heye. Ger biryara Dadgeha Federal pêkbê, wê Herêma Kurdistan 100 pêngav paşde biçe."
Şaxewan got ku ji ber zelalî û ne şefafiya di dosya nefta Kurdistanê de, niha piraniya xelkê Kurdistanê dixwaze hemû dahata herêmê, xalên ser sînor, dahata navxweyî û hemû dahatên din bi Bexdayê ve were girêdan. Şaxewan got ku welatî dixwazin ji Bexdayê mûçeyê wan were belavkirin.
Şaxewan herî dawî li ser dijberiya PDK'ê û bêdengiya hizbên din ya li hemberî biryara Dadgeha Federal a Iraqê got; "Nabe tenê PDK xwe bibe xwediyê dijbertiya biryara Dadgeha Federal. Pêwîste hemû hizb bi hevre xwedî biryar bin."

***ROJNEWS***

# Zeyd El–Eyûbî: Erdogan li ser aştî û ewleyiya navneteweyî dîktatorekî xeternak e

Parêzer û nivîskarê siyasî yê filistînî Zeyd El-Eyûbî da zanîn ku Erdogan li ser aştî û ewleyiya navneteweyî dîktatorekî xeternak e û ji bo hesabxwestinê ji dewleta tirkî ya dagîrker du xalên sereke destnîşan kirin



Li ser sûcên ku Erdogan pêk tîne, parêzer û nivîskarê siyasî yê filistînî yê ji Qudisê Zeyd El-Eyûbî bi rêya online bi ajansa me ANHA'yê re, axivî.

El-Eyûbî di destpêka axaftina xwe de îşaret pê kir ku tiştê herî xeternak li dijî gelan tê kirin dagirkeriya hovane ye. Li dijî filistîniyan sûcên şer pêk tên û pê re rû bi rû ji demekê ve dijîn.

El-Eyûbî anî ziman ku panelên têkildarî herêmên Sûriyê yên ji hêla artêşa Tirk ve hatine dagirkirin, tên lidarxistin şêweyek ji şêweyên berxwedanê ye û got: "Bi rêya panel û konferansan bendest, birîndar û xwediyê xakê dikarin dengê xwe bilind bikin û bibe dengvedaneke mezin."

El-Eyûbî dagirkeriya Tirk a li herêmê bi dagirkeriyeke hovane ku gefan li çarenûsa gelan dixwe wesif kir û ev tişt got: "Dagirkeriya Tirk dagirkeriyeke hovane ye, êrişî pêşeroja gelan dike. Ew dagirkeriyeke sûcdar bi hemû wateya xwe ye, bi hezaran welatî kuştin, mal wêran kirin, welatî koçber kirin û bi qutkirina avê li ser bakur û rojhilatê sûriyê welatî tî kir."

**'Li gorî qanûna navneteweyî qutkirina avê sûc e'**

Girêdayî qutkirina ava çemê Firatê ji aliyê dewleta Tirk ve, El-Eyûbî wiha domand: "Her kes mijara nakokiya li ser çem dizanin ku êdî dewleta Tirk parçeyek ji serweriya xwe dihesibîne. Lê li gorî qanûna navneteweyî, çem ji jêderê heta derbasbûna li deryayê de yek e, mafê tu kesî nine ku avê fînanse bike."

El-Eyûbî bi domdarî got: "Bê guman qutkirina avê cureyek ji şerê li dijî welatiyan e, ji ber şerê qirkirina etnîkî ye. Dema mirovî tî dibin, mebest qetilkirin e. Bi wê re niyeta komkujî û niyeta koçberiya bi darê zorê heye. Ev yek di peymana Cinêvê ya 4'an û peymana Lahay a 1917'an de, her wiha di Mîsaqa Roma de ku damezrînerê dadgeha sûcên navneteweyî ya 1998'an ya madeyên wê yên 7 û 8'an de jî heye. Di naveroka wan peymanan de hedefgirtina welatiyan bi sûcên mezin û bi zanabûn ji bo armancên siyasî, sûcekî şer e."

El-Eyûbî destnîşan kir ku dema malên welatiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê dewleta Tirk ve tên wêrankirin, çi Kurd, çi Ereb û çi pêkhateyên din dibin, ev tê wateya ku dewleta Tirk sûcên şer pêk tîne. El-Eyûbî wiha pê de çû: "Ji ber wê divê cîhanê bi tevahî ji bo rawestandina wêrankirina malan, koçberkirina welatiyan, qetilkirina wan, avakirina avahiyan û bicihkirina şêniyên nû li şûna yên resen ku demografiya herêmê pêk bê, tev bigere. Ev hemû mijar dikevin xana sûcên xeternak ên li dijî aştî û ewlehiya navneteweyî. Ji berpirsiyariya cîhanê ye ku van sûc û binpêkirinên ku Erdogan dîktator pêk tîne bi dawî bike."

**'Dozên bi ser dikevin ew dozên ku li ser asta raya giştî ya cîhanê tê hembzêkirin'**

Parêzer û nivîskarê siyasî yê filistînî Zeyd El-Eyûbî îşaret bi rêyên guncaw ên sekna li hember dewleta Tirk kirin û wiha berdewam kir: "Pir girîng e em wek beşekê di vê mijarê de li ser du rêyan bixebitin; ya yekemîn peyama welatiyên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bigihinin derve. Divê têkilî bi civaka navneteweyî re bi hemû beşên wê re werin çêkirin, çi li ser asta fermî dibe yan jî hikumet, partî, rêxistinên mafên mirovan an jî civata sivîl dibe, divê rayeke giştî ya cîhanê ji bo piştgiriya vê dozê ava bikin û ji bo li kêlek bendestan li pêş vê dagirkeriya Tirk bisekinin. Ya duyemîn jî, wek parêzeran û qanûnnansan mijara me ye, ew jî em berê xwe bidin dadgehên navneteweyî û vê dozê vekin da ku dozê li van sûcdaran vekin, ji wan jî Erdogan, fermandarên leşkerî û siyasî, her wiha li dijî her kesê destên wan di qetilkirina mirovan, koçberkirin, tîkirin û wêrankirina malên wan de heye."

Mebesta dadweriyê; Dadgeha Cezayan a Navneteweyî yan jî dadweriya gelek dewletan e ku darizandina dozên bi vî rengî dipejirîne, nemaze li dewletên Ewropayê li gorî rêgeza "gerdûnîbûna tawanan û cîhanîbûna navarokê" ku sûcên bi vî rengî di çarçoveya berpirsyariya navnteweyî ya her dewletekê ku aştî û ewlehiya navneteweyî û mafên mirovan li seranserî cîhanê biparêze de ceza dike.

Li ser vê yekê, El-Eyûbî ev tişt got: "Divê em van her du rêyan bi hev re bimeşînin û hewl bidim tîmekî çapemenî û qanûnî ava bikin ku bi cîhanê re nîqşa bikin, serdana zanîngeh, sazî heta komeleyên li ser astên dewletên cîhanê jî bikin. Da ku rayeke giştî ya cîhanê ji bo vê dozê wergirin, dostan û hezvanên vê doza adilane û rast qezenc bikin. Ev berpirsiyarî dikeve ser milê hemûyan, di radeya yekemîn de erka partiyên siyasî ye, her wiha erka her beşekê û her kesê dikare binivîse û biaxive û bi gihandina peyaman bes nebînin. Ji ber dozên bi ser dikevin, dozên ji aliyê raya giştî ya cîhanî ve tê hembêzkirin e."

El-Eyûbî diyar kir ku têkildarî sûcên Erdogan û alîgirên wî dikin, helwesteke wan a qanûn û siyasî heye û ev tişt anî ziman: "Em dikarin filistîniyan bi qurbaniyên siyaset û berjewendiyên Erdogan ên li herêmê wesif bikin. Ji ber ku Erdogan destekê dide koman ku parçebûn û darbaya di nava gelê filistînê de çêke."

Der barê siyasetên Erdogan li dijî doza filistiniyan de El-Eyûbî ev yek xuya kir: "Em siyasetên Erdogan ên nebaş ên li dijî doza filistîniyan dizanin, herî dawî jî astengiyên li Qudisê bû. Beriya çend rojan wezîrê karên derve yê Tirkiyê serdana Mescid El-Eqsa kir, dûre serdana gorê Theodor Herzl kir û kulîlk danî ser gora wî yê damezrînerê cihûya cîhanî bû ku jiyana xwe kir xizmetî avakirina statûya Îsraîlê li ser hesabê gelê Filistînê."

**'Hilbijartinên 2023'yan wê zirarên mezin ên erdogan eşkere bikin'**

El- Eyûbî diyar kir ku Erdogan ne tenê sûcên şer li dijî kurdan û Sûriyê dike, lê belê li dijî herêmê tevahî dike. Hemû ji ber vî sûcdarî û dîktatorê xeternak diêşin, lê yê nebaş ji bo Erdogan, rojane derewên wî û bazirganiya wî bi dozên gelan tên îsbatkirin.

Li ser hilbijartinên Tirkiyê, El-Eyûbî texmîn kir ku Erdogan di hilbijartinên 2023'yan de bi ser nakeve, lê tenê heke sexte di hilbijartinan de kir an jî bi xwe darbe li ser saziyên destûrê yên li hundirê Tirkiyê çêkirin, wê demê bi ser dikeve.

Parêzer û nivîskarê siyasî yê filistînî Zeyd El-Eyûbî wiha dawî li gotina xwe anî: "Li dawiyê, siyaseta Erdogan a bi sûc eşkere ye. Ji bo têkbirina dagirkeriya Tirk, ji hespvan bigire heta bi şervanên ji bo çarenûsê pêdiviya me bi danîna plan, stratejiyan û baweriya rasteqîn bi edaleta vê dozê heye."

***ANHA***



## Ji bo dijberiyê di nava pêşbirkê de ne

**Dilyar Cizîrî**

Di van deman de ku Erdogan gefên xwe yên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirine û li bendê ye çiraya kesk ji hêzên qaşo garantor Rûsiya û Amarîka bigre da êrişî herêmê bike, di nava civaka herêmê de metirsiya careke din şer, koçberî û wêranî çêbûye. Di heman demê de jî civak bi hemû beşên xwe di nava amadekariyeke mezin de ye. Bi her awayî wê li ber xwe bide û li kêleka şervanên xwe parastina nirxên xwe yên bi xwîna dehezaran şehîd bi dest xistine, bikin.

Di rewşeke wiha de hikûmeta Şamê û Rûsiya bi her awayî piştgiriya wê dike, ketine nava liv û tevgerê ji bo ji xwe re qezencekê bi dest bixin. Dixwazin di binê sîwana gefên Erdogan de QSD'ê û Rêveberiya Xweser bixin binê zexta bi mecbûrî ji bo xwe ji êrişên dewleta Tirkan biparêzin, bi hikûmeta Şamê re itîfaqan çêke û herêmê ji wan re berde.

Di vê çarçoveyê de hin alî behsa danûstendineke xurt di navbera QSD'ê û hikûmeta Şamê de heye, dikin. Heta di hin dezgeh û saziyên girêdayî hikûmeta Şamê de tê gotin, QSD'ê û hikûmeta Şamê lihev kirine û wê bi hev re li dijî dewleta Tirkan ya dagîrker şer bidin meşandin.

Di hevdîtina Serokê Sûriyê Beşar El-Esed ya dawî de ya di saziyên ragihandinê de behsa berxwedana li dijî êrîşeke muhtemel ya dewleta Tirkan kir. Lê di heman demê de got ev di cihên di binê serweriya artêşa wî de, di heman demê de got gelek herêmên Sûriyê ne di binê serweriya wan de ne.

El-Esed di vir de peyama xwe eşkere anî ziman, dibêje ew bi tu awayî nêzîkî êrişa muhtemel ya li dijî herêmên Rêveberiya Xweser nabin. Pê jî ji Rêveberiya Xweser herêmê beranberî tiştên erzan û bêqîmet, herêmê radestî wan bikin.

Aliyê serkêşiya vê plana hikûmeta Şamê dike jî Rûsya ye. Rûsya her çendî di şerê Ukranya de tengav bûye jî, dixwaz gefên Erdogan û dijberiya wî bi Rêveberiya Xweser û QSD'ê re ji bo berjewendiyên xwe istismar bike. Di heman demê de û têkildarî heman mijarê daxuyaniyên fermandariya QSD'ê jî hebû. Ew jî bi zimanekî nerim amadekarî û piştgiriya xwe ya ji bo parastina herêmê nîşan didin. Ev helwesta fermendariya QSD'ê di hemû şert û mercan de ne hatiye guhertin, lê wekî me berê jî got, Rûsyaya li Ukranya winda dike, dixwaze dewleta Tirkan li dijî me bi kar bîne û bi qezencekê di herêmê de derkeve.

Ji ber wê pêwîstî bi beldarî û hişyariyeke mezin heye. Ev jî di civîna sê alî ya QSD, Rêveberiya Xweser û MSD'ê de xuya bû. Li wir jî baş diyar dibe amadekariyeke baş ji bo parastinê di aliyên leşerî, dîplomasî û civakî hatiye, kirin. Ev jî wê bibe sedem deng û hevsengên şer ku dewleta Tirkan, hikûmeta Şamê û Rûsiya dixwazin ji xwe re istismar bikin, wekî ew dizwazin pêk neyê.



# Pirsgirêka kamp û girtîgehên DAIŞ`iyan û reva dewletan ji erkê xwe

**Xalid Etê/Qamişlo**

Doktora qanûna navneteweyî ya Fransî da zanîn ku bakur û rojhilatê Sûriyê ne girtîgeha Guwentenamû ye. Divê dewletên têkildarî doza DAIŞ`ê li peymanên imze kirîn, xwedî derkevin; yan welatiyên xwe vegerînin yan alîkariya hiqûqî, siyas û lojistîk bibin Rêveberiya Xweser.

Têkildarî doza çeteyên DAIş`ê û malbatên wan yên li kamp û girtîgehên bakur û rojilatê Sûriyê, vegerandina wan, avakirina dadgeheke navneteweyî û erkê dewletên têkildar, Doktora Frenasî ya Qanûna navnetewyeî Seve Izouli ji me re axivî.

**`Avakirina Kamp û girtîgehan ji aliyê Rêveberiya Xweser ve pêwîst û girîng bû`**

Seve Izouli diyar kir ku avakirina kamp û girtîgehan ji endamê DAIŞ`ê û malbatên wan re ji aliyê Rêveberiya Xweser pêwîst û girîng bû. Lewra berî hezaran çete û malbatên wan li Rojava hiştine, wê pirsgirêk û xetera wan çawa çareser bibin? Eger hûn nikaribin çareser bikin, erk û misyona xwe pêk bînin, rêveberiyeke nû û bi derfertên sînordar wê çawa çareser bike ? Ev ne mentiqî ye!. Rojava ne girtîgeha Guwentenamo ye ku tundrew û çeteyan li cîhanê lê kom bikin, bêdadgeh û bêqanûn bimînin. Rêveberiya Xweser jî ne dergevana wê ye. Koalisyon û dewletên ku çeteyên xwe nagirin, li hemberî Rêveberiyê û gelên herêmê bêrêziyeke mezin dikin. Ji aliyekî din ve naxwezin bi fermî xweseriya wan nas bikin. "

**Qanûna Navneteweyî çawa li kamp û girtîgehên DAIŞ`iyan dinêre?**

Li ser rewşa girtîgeh û kampên DAIŞ`iyan û malbatên wan ji aliyê qanûna navneteweyî ve û avakirina dadgehekê, doktora qanûna navneteweyî ev şîrove kir: "Bi rastî piştî şerê Baxozê diviya ji bo darezandina van navneteweyî ku bixwe peyaman imze kirine, binpê dikin."

**Astengiyên li pêşiya avakirina dadgehê û berjewendiyên siyasî û aborî yên dewletan..**

Seve Izoulî herwisa bal kişand ser berjewendiyên siyasî û aborî yên dewletan ku rê nadin avakirina dadgeheke girêdayî doza DAIŞê û ev agahî dan: "Lêbelê ji bo avakirina dadgehekê pêwîstî bi biryara Konseya Ewlekariya Nanventeweyî heye. Lê ji destpêka krîza li Sûriyê ve vîtoya Rûsya rê nade li hemberî rejima Sûriyê ti biryar bê standin. Ji ber wê avakirina dadgehekê bê rêjima Sûriyê li bakur û rojhilatê wê di şert û mercên heyî de ne pekan e. Ev jî li gorî qanûnê navneteweyî rast e. Lewra Rêveberiya Xweser ji aliyê cîhanê ve nayê naskirin. Wê çaxê derveyî Konseya Ewlekar divê biryara avakirina dadgehê bê dayîn. Niha di dîrokê de li Yugoslavya, Siralîonê û Ruwanda di dema şerê navxweyî de



bidawîkirina şerê rizgakirina Baxoza Dêrazorê yê 2019`an, bi hezaran çete û `terorestên` DAIŞ`ê ji Reqa û bajarên din xwe radestî Rêveberiya Xweser û Hêzên QSD`ê kirin. Herwisa beşke ji wan yên xwe radest nekirîn di şerî de hatin girtin. Negirtina çeteyan û serbestmayîna wan, ewleyiya herêmê û cîhanê rûbirûyî xetereke mezin dikir. Rêveberiya Xweser jî erkê xwe pêk anî.

**`Lê Rojava ne girtîgeha Guwentenamo ye!`**

Dektora qanûna navneteweyî herwisa diyar kir ku diviya koalisyon navneteweyî jî erkê xwe pêk bîne û ev nirxandin kir: "Diviya Koalisyonê jî çarenûsa çete û malbatên wan yên girtî çareserke bike, vî erkî neavêje ser milê Rêveberiya Xweser tenê, ku derfetên wê bixwe kêm in. Dewletên mîna Frensa, Almanya û welatên Ewropî dibêjin bi vegera 200-300 malbat û çeteyên DAIŞ`ê, emê rastî pirsgirêkên mezin bên. Erê baş e we bi çeteyan dadgheke navneteweyî bê avakirin û ciyê wê diviya li Rojava bûya. Da gelê herêmê êş û birînên xwe ji dadgehê re vegotan û mafê wan bihata misogerkirin. Lewra li gorî qanûnê ciyê sûcdar lê sûc kirî li wir tê darizandin. Herwisa li wir belege, şahid, qurban û wêraniya bûyî ji ber sûcên wan şênber in. Jixwe li gorî qanûnên navneteweyî û mafên mirovan yên bingehî -ku sedem çi be bila bibe binpêkirina wan ne pêkan e- Her mirov, terorsîst be, çete be, her çi be mafê wî heye di demeke kurt de, bê darizandin û mafên wî bên misogerkirin. Lê em bala xwe didin rewşa kamp û girtîgehên li Rojava yên çete li wan, bi salan e zarok, jin û çeteyên DAIŞ`ê ji mafêdarizandinê bêpar in. Ev jî li dijî mafê mirovan û qanûnên navneteweyî ye. Yên berpirs û sûcdar jî dewletên mezin û koalisyona navneteweyî ne. Dewletên ku welatî û jin û zarokên xwe venagerînin, di navê de welatên Ewropî, qanûn û mafên mirovan yên dadgeh çêbûna. Dikarin ji bo DAIŞ`ê jî dadgeheke cuda ji ber şerê navxweyî yê Sûriyê pêk bînin. Riya duduyan avakirina dadgehekê li bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Wê demê divê ji rêveberiyê re alîkariyên hiqûqî, lojîstîk, aborî ji aliyê koalisyonê ve bê kirin. Ev riya duduyan bê erêkirina Konseya Ewlekar pekan e. Lê mixabin tersî wê alîkariyê nadin û barê xwe diavêjin ser milê rêveberiyê."

**Durûtiya qanûnan û sîstema Nevteweyên Yekbûyî..**

Li ser banga vegerandina çete û malbatên wan ji aliyê NY, YE û saziyên hiqûqî ve ji girtîgeh û kampên bakur û rojhilatê Sûriyê, Seve Izoulî wiha axivî: "Dewletên têkildar pêwîstiya vê bangê pêk naynin û li dijî qaûnan tev digerin. Ji ber wê di deh salên dawî de li cîhanê qanûn û mafên mirovan paş ve diçin. Dewletên ku xwe demokaratîk û parzvanên qanûn û mafê mirovan nîşan didin, bixwe wan binpê dikin. Berjewendiya wan ya aborî, siyasî û leşkerî li kû be wê dikin û çekan difiroşin. Guh nadin mafê mirovan. Atmosfereke wisa ava bûye, kî mafên mirovan binpê dike, bêhesaxwestin dimîne. Ji bo ku dewletên cîhanê ji vê sîstemê rizgar bibin, divê sîstema NY bê guhertin, tedbîrên nû bên girtin û Konseya Ewlekar li ser pîvanên mafê mirvan û demorkarsiyê bê avakirin û reformekirin. Rewşa ku 5 dewlet tenê cîhanê bi rê ve dibin bê guhertin û mafê vîto ji destê wan bê girtin. Herwis nûnertiya rast ya tevayiya cîhanê li saziyên navneteweyî bê kirin. Da jiyana azad û demokatîk ji her kesî re bê misogerkirin û bikarin pêşiya fikrên tarî bigirin. "



**Vejîna DAIŞ`ê jinûve…**

Doktora qananûna navneteweyî Seve Izoulî diyar kir ku çaresernekirina doza girtiyên DAIş`î û malbatên wan rewşeke pir giran û bixeter derdixe holê û êrişa 20ê Çileya îsal ya DAIŞ ya ser girtîgeha Hesekê ev teqez kir û axaftina xwe wiha qedand: "Êrişa ser girtîgeha Hesekê dîsa teqez kir ku ewleyiya herêmê û tevayiya cîhanê ji ber çeteyên DAIŞ`ê di xeterê de ye. Diyar dibe ku hê bihêz e û dikare xwe jinûve zindî bike. Kampa xwe organîze dikin û di nava kampan de zarokan perwerde dikin. Ji ber wê dikarin jinûve dewleta xwe jî ava bikin. Divê koalisyona navneteweyî li hemberî vê rewşê cidî tev bigere, alîkariya mayînde bi Rêveberiya Xweser re bike."

**Kamp û girtîgehên DAIŞ`iyan yên li bakur û rojhilatê Sûriyê**

Li gorî amarên Rêveberiya Xweser nêzî 12 hezar çeteyên DAIŞê di girtîgehên wê de hene. Herwisa li gorî Desteya Karûbarên Koçber û Penaberan li Kampa Holê 56124 endamên malbatên DAIŞ`iyan hene. Ji wan 8109 biyanî, 29152 Iraqî ne. Ji wan 36057 zarok in (5738 biyanî ne û 17879 iraqî ne) 16425 jin in ( 8602 iraqî ne û 2370 biyanî ne. Herwisa li kampa Roj 2666 endamê malbatên DAIŞ`iyan hene (2310 biyanî ne). Ji wan 1784 zarok in (1582 biyanî, 162 iraqî ne) 810 jin in (725 biyanî, 73 iraqî ne).



## Divê Rûsya li hemberî dagîrkerên Tirk bibe xwedîhelwest

**Zekî Bedran**

Dema Erdoganê faşîst plana dagîrkirina nû ya bakur-rojhilatê Sûriyê ragihand, daxuyaniya wazîrê karê derve yê Rûs balkêş bû. Qaşo Amerîka dixwaze bi Kurdan dewletekê bide avakirin, ji ber wê Tirkiye bêdeng namîne. Lavrov berî hingê jî daxuyaniyên wisa dabûn. Di demên krîtîk de daxuyaniyên wiha ne bêwate ne. Piştî wê daxuyaniyê jî Lavrov hat Tirkiyê û bi rayedarên wê re hevdîtin kir. Tê fêmkirin ku hevdîtin li ser derxistina hin herêman ji destê Rêveberiya Xweser e.

Lavrov dibêje, Tirkiye li hemberî geşedanên li herêmê nikare bêdeng bimîne. Li herêmê çi qewimî, ango tişta bûyî çi ye? Tişta nû ew e ku Tirkiye plana dagîrkirinê ya nû ji Efrînê heta Dêrikê bi kûrayiya sî km dixe rojevê. Ji bilî vê tiştek nîne. Bi taybetî ku faşîstên Tirk ku Minbic û Til Rifet dikin amanc nîşan dide ka niyeta wan çiqas xirab e. Li ser Minbicê rayedarên Amerîka û Tirkiyê li hev kiribûn û pêk hatibû. Piştî hingê li Minbicê ti guherîn çênebûn. Minbic ne li ser sînorê Tirkiyê ye. Ji wir ti êriş jî li ser Tirkiyê çênebûne. Til Rifet jî wisa. Di ser de ev herêm ji aliyê çeteyên Tirkan ve her tim tên topbarankirin.

Qeneeta giştî ew e ku Rûsya dixwaze herêmên weke Minbicê rêveberiya Şamê ve girê bide. Rûsya gefên Tirkiyê bi kar tîne û dixwaze gel neçarî xwespartina Şamê bike. Rûsya bi vê siyaseta xwe wê serkeftinên sexte bi Erdogan bide qezenckirin û di hilbijartinê de destê wî xurt bike. Herwisa bibe sedem ku bibe belaya serê Tirkiyê û herêmê û temenê xwe dirêj bike. Tikiyê bi dijminiya Kurdan navê xwe li dinyayê derxist. Bi itîfaqa Erdogan-Bahçelî ev dijminî xurttir bû. Armanca vê itîfaqû ya bingehî temamkirina qirkirina Kurdan e. Divê hêzên weke Rûsya ji vê senaryoya bixwîn re nebe alîkar. Li aliyê din gelên li bakur-rojhilatê Sûriyê û Kurdan navcîtiya Rûsya qebûl kirine. Bila bi Şamê re pirsgirêkên navbera xwe çareser bikin û yekbûna welat biparêzin. Rûsya ji her kesî pirtir dikare ji bo yekbûna Sûriyê bibe alîkar. Herêmên xweser ne li dijî vê navcîtiyê ne.

Rûsya, li şûna ku ji çareseriya pirsgirêkan re bibe alîkar, bi dagîrkerên Tirk re ku dijminiya Sûriyê dike, li ser planên dagîrkirinên nû bazadê dike. Di serdana lavrov ya li Enqere de helwesteke bibiryar ya Lavrov nehat dîtin. Rûsya dikariya pêşiya van planên dagîrkeriyê bigire û helwesteke zelal diyar bike. Lê ev nehat dîtin. Hat gotin wê bazar dewam bike. Dibe ku Rûsya di zorê de be. Li Ukrayna welatên Rojava blok ava kirin. Tirkiye dixwaze ji rewşa zoriya Rûsya sûdê bigire. Tirkiyê her tim keysbazî kir. Li Sûriyê ji nakokiyên navbera Rûsya û Amerîka sûd girt û herêmên fireh dagîr kirin. Zorî çi dibin bila bibin bê Amerîka û Rûsya Tirkiyê nikare Sûriyê dagîr bike. Lewra qada hewayî ya Sûriyê di navbera her du welatan de hatiye parvekirin. Bê qada hewayî artêşa tirkî nikare di erdê de pêş bikeve û şer bike. Çiqas çeteyan bide pêş jî encamê nagire. Dema Erdogan dengê xwe bilind kir û got, emê Til Rifet û Minbicê bistînin, yên herêmê nas dikin gotin, bê erêkirina Rûsya nikarin wiha biaxivin. Dinya tev dizane eger Rûsya nebêje erê, Tirkiye nikare bikeve van herêman û encamê nagire. Gelên bakur-rojhilatê sûriyê di vê mijar de pir bitecrûbe û zana ne. Bê lihevkirina bi Rûsya re Tirkiyê nikariya bikeve Efrînê. Bê lihevkirina bi Amerîka re jî nikariya bikeve Girê Spî û Serê Kaniyê. Niha jî bê lihevkirina bi van dewletan re wê plana Tirkiyê di destê wê de bimîne.

Tirkiyê, hem zorê dide Rûsya hem Amerîka û NATO. Dibêje hûn di şerê min yê li hemberî Kurdan de destekê bidin min. Di êrişên Iraqû de jixwe desteka Amerîka û NATO heye. Dibêje ezê li Sûriyê Kurdan tasfiye bikim, divê hûn jî bibin şirîkên min.

Herêmên Sûriyê yên herî ewle û demokratîk herêmên xweseriya demokratîk lê hatîn avakirin ew in. Bi sedhezran mirov ji herêmên din yên Sûriyê reviyane û li van herêman bi cî bûne. Dewleta tirkî ji van herêman re dibêje herêmên terorê. Li herêmên wê dagîr kirîn her rengê sûc tê kirin. Ji DAIŞ' heta El Qaîdeyê her kes li van herêman e. Dewleta tirkî ji van herêman re dibêje herêmên ewle û li ser wan bi dinyayê re bazarê dike. Li hemberî van lîstikan divê gelên Sûriyê şiyar bin û parastina xwe ya rewa bigirin ser xwe. Lîstik enceq bi berxwedana gelan ya birêxistin bên bêbandorkirin.